*Bidestveanîna mafên netewî yên gelê kurd
di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

# Agirî

Duheftînameyek Siayasî-Giştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî
www.agirimedia.org Hejmar (514) *21-03-2026*



## Nûnerî û hêzdarkirina jinan pêwîstiyeke siyasî ji bo pêşerojeke dêmokratîk

N. Mojgan Elîpûr

Eger em li têkoşîna gelê Kurd li Rojhilatê Kurdistanê binêrin, em dibînin ku têkoşîna ji bo dêmokrasiyê li Rojhilatê Kurdistanê ne tenê têkoşîna guhertina rejîmê bû, lê di heman demê de têkoşîna guhertina bingeha pergala siyasî û civakî bûye. Demokrasî wateya xwe ya tevahî digire dema ku hemû beşên civakê bikaribin bi wekhevî beşdarî pêvajoya biryardan û çêkirina polîtîkayê bibin. Di vê çarçoveyê de, beşdariya jinan ne tenê . . . . .

Dom» R:9



## Êvara Ayetullahan: Tektonîka Jeopolîtîk û Hişyariya Kurdî

N. Dr. Mecîd Heqî

Dibe ku dîroknas roja 28'ê Sibata 2026'an wekî dawiya tecrubeya teokratîk a herî mayînde ya sedsala 20'an tomar bikin. Di operasyoneke leşkerî ya hevaheng û birûskî de, Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê û Îsraîlê operasyoneke "bêserîkirinê" (decapitation strike) li dijî bingeha Komara Îslamî ya Îranê pêk anîn.Di nava çend saetan de, desthilatdariya mutleq a Rêberê Bilind Elî Xameneyî, tevî çil berpirsên pilebilind ên leşkerî û siyasî yên rejîmê, hat hilweşandin.

Dom» R:5



## Bandora psîkolojîk a şer û nezelaliyê li ser mirovên sivîl


N. Sefiye Xalidî

Jiyana di bin siya şer de, Şerê çekdarî bandorê li civakê dike, ji wêrankirina berbiçav a binesaziyê û pergalên aborî wêdetir. Yek ji encamên şer ên herî kûr lê kêmtir di cih de xuya ye, bandora wê li ser refaha psîkolojîk a nifûsa sivîl e. Dema ku civakek di nav tengezariya leşkerî ya domdar, nezelaliya li ser pêşerojê û astengiyên jiyana rojane dijî, bandorek mezin li ser tenduristiya welatiyên wê dibe.

Dom» R:9




# Peyama Newrozê ya Desteya Kargêrî ya Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê



**Peyama Mistefa Hicrî, Sekreterê Giştî yê Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê derheq bi hatina Cejna Remezanê**

Hatina Cejna Remezanê, boneyeke pîroz a misilmanan, li hemû peyrewên olê Îslamê, bi taybetî li hawniştîmaniyên misilman li Kurdistanê pîroz be.

Mixabin, bi sedema şerxwaziyên Komara Îslamî, cejna îsal reng û bêhna asayî nîne. Di demekê de ku rêjîma Îranê bi salan e bi navê pîroziyên dînî, mafê jiyan û asayîşê ji xelkê Îranê zewt kiriye, em hemû wan ezîzan bi bîr tînin ku bi sedema siyasetên vê rêjîmê ve bûn qurbanî.

Hêvîdar im rojek bê ku seqamgirî û aştiya rastîn cîgir bibe û cejna îsal jî bibe sedema yekgirtûyî û tebayiya xelkê Kurdistanê bi dijî zordariyê.

Bi hêviya cejna rizgarî û azadiyê.

**Mistefa Hicrî**
**Sekreterê Giştî yê Hizba Demokrat a Kurdistana Îranê**
**27ê Reşemeya 1404ê Hetawî**
**18ê Adara 2026ê Zayînî**



## Peyama Newrozê ya Desteya Kargêrî ya Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê

Di demekê de em ber bi Newrozê ve diçin ku neteweya Kurd bi niyet e bêtirî her carê vê boneyê -ku hevdem e ligel guhertinên Îran û navçeyê- bike hewênê berxwedan, yêkgirtîbûê û yêkrêziya nîştimanî.

Di heman demê de em ber bi pêşwaziya boneyekê ve diçin ku ji bo beşek ji neteweyên din, tenê çavkaniya nûbûna xwezayê ye, lê li Kurdistanê xwediyê wateyeke cudatir e. Newroz ji bo neteweya Kurd bi wateya rabûn û serhildana li dijî stem û bindestiyê tê, wateyek ku dikare di deqa guhertinên niha û yên paşerojê de watedar û îlhambexş be û Kurd li Rojhilatê Kurdistanê û bizavên wê bi hestyarî ve lê binêrin.

Sala nû, nûnerê rewşeke nû ye ku tê de neteweyek -ku di dilê xebat û berevaniyê de hatiye qalkirin- dîrokeke nû ji bo xwe dinivîse.

Heke Newroza par ji bo me Newroza xakîpoşan û dema nûkirina peymana wefayê ligel xakîpoşên nîştiman "Pêşmerge" bû, nexwe Newroza 1405an wek nîşan û hiviya rizgariyê di dîroka vê neteweyê û di vê beşa nîştiman de tê tomarkirin. Ev werçerxana dîrokî, encama herifîna yekcarî ya desthilateke stemkar e ku bi dehan sal bû jiyana neteweyên Îranê kiribû qurbaniya siyaseta tepeserî û berfirehxwaziya xwe.


Em di demekê de pê diavêjin nav vê sala nû ku cîhan şahidê hilweşîna yek ji dîktatoriyên sedsala 21an ne. Tev bûyerên sala par ew rastî selmandin ku pêgeh û rewayiya siyasî û desthilatdarî bi xwîn, sêdare û serkutê nayê avakirin, jêrxana rastîn a Îranê ku diba samana mirovî, keramet û jiyaneke şayiste ji bo xelkê be, ji aliyê rejîmê ve hat wêrankirin.

Encama siyaseta çewt a rejîmê, ji destpêka hatina ser desthilatê heta niha, siyaseta bêparkirin û şikandina kerameta mirovan û mafên wan bûye.

Krîza aborî ya berfireh, derencama vê siyasetê ye. Ev hilweşîna aborî encama planên rejîmekê ye ku çavkanî û samanên neteweyî yên neteweyên Îranê ji bo projeyên terorîstî û biçekkirina komên çekdar li derveyî sînoran xerç dikir, bi rêya hinardekirina şoreşê wek gefeke micid ji bo navçeya Rojhilata Navîn hat qadan û di encam de bertekên welatên navçeyê û cîhanê li pey xwe anîn.

Di vê salê de, şerê 12 rojî xaleke werçerxanê ya bêwêne û yêkalîker bû ku ne tenê lawaziya sîstema bergiriya rejîmê ji bo cîhanê eşkere kir, belku ziyaneke berfireh jî gihand jêrxan û laşê nîv-rihî yê aboriya Îranê. Bi armancgirtina rêber û rêveberên leşkerî, ewlehî û dezgehên serkutê, herwiha neşiyana di dabînkirina enerjiyê de, şiyana berhemhênan û seqamgiriya bazarê gihand asta herî nizm. Di encamê de, bihayê diravê Îranî ber bi herifîneke wisa ve çû ku jiyana rojane ya xelkê tûşî şokê kir....

Dom » R:2




## Em êrîşên terorîstî yên rejîma Îranê bo ser penaber û partiyên siyasî li Herêma Kurdistanê

Dom » R:11




## Peyama Newrozî a Hevpeymaniya Hêzên Siyasî yên Kurdistana Îranê

Dom » R:4

# Peyama Newrozê ya Desteya Kargêrî ya Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê

## Dema yêkrêziya meydanî û têkşikandina paşmayiyên rejîma Komara Îslamî ye

Di demekê de em ber bi Newrozê ve diçin ku neteweya Kurd bi niyet e bêtirî her carê vê boneyê -ku hevdem e ligel guhertinên Îran û navçeyê- bike hewênê berxwedan, yêkgirtîbûê û yêkrêziya nîştimanî.

Di heman demê de em ber bi pêşwaziya boneyekê ve diçin ku ji bo beşek ji neteweyên din, tenê çavkaniya nûbûna xwezayê ye, lê li Kurdistanê xwediyê wateyeke cudatir e.

Newroz ji bo neteweya Kurd bi wateya rabûn û serhildana li dijî stem û bindestiyê tê, wateyek ku dikare di deqa guhertinên niha û yên paşerojê de watedar û îlhambexş be û Kurd li Rojhilatê Kurdistanê û bizavên wê bi hestyarî ve lê binêrin.

Sala nû, nûnerê rewşeke nû ye ku tê de neteweyek -ku di dilê xebat û berevaniyê de hatiye qalkirindîrokeke nû ji bo xwe dinivîse. Heke Newroza par ji bo me Newroza xakîpoşan û dema nûkirina peymana wefayê ligel xakîpoşên nîştiman "Pêşmerge" bû, nexwe Newroza 1405an wek nîşan û hiviya rizgariyê di dîroka vê neteweyê û di vê beşa nîştiman de tê tomarkirin.

Ev werçerxana dîrokî, encama herifîna yekcarî ya desthilateke stemkar e ku bi dehan sal bû jiyana neteweyên Îranê kiribû qurbaniya siyaseta tepeserî û berfirehxwaziya xwe.

Em di demekê de pê diavêjin nav vê sala nû ku cîhan şahidê hilweşîna yek ji dîktatoriyên sedsala 21an ne. Tev bûyerên sala par ew rastî selmandin ku pêgeh û rewayiya siyasî û desthilatdarî bi xwîn, sêdare û serkutê nayê avakirin, jêrxana rastîn a Îranê ku diba samana mirovî, keramet û jiyaneke şayiste ji bo xelkê be, ji aliyê rejîmê ve hat wêrankirin.

Encama siyaseta çewt a rejîmê, ji destpêka hatina ser desthilatê heta niha, siyaseta bêparkirin û şikandina kerameta mirovan û mafên wan bûye. Krîza aborî ya berfireh, derencama vê siyasetê ye. Ev hilweşîna aborî encama planên rejîmekê ye ku çavkanî û samanên neteweyî yên neteweyên Îranê ji bo projeyên terorîstî û biçekkirina komên çekdar li derveyî sînoran xerç dikir, bi rêya hinardekirina şoreşê wek gefeke micid ji bo navçeya Rojhilata Navîn hat qadan û di encam de bertekên welatên navçeyê û cîhanê li pey xwe anîn.

Di vê salê de, şerê 12 rojî xaleke werçerxanê ya bêwêne û yêkalîker bû ku ne tenê lawaziya sîstema bergiriya rejîmê ji bo cîhanê eşkere kir, belku ziyaneke berfireh jî gihand jêrxan û laşê nîv-rihî yê aboriya Îranê.

Bi armancgirtina rêber û rêveberên leşkerî, ewlehî û dezgehên serkutê, herwiha neşiyana di dabînkirina enerjiyê de, şiyana berhemhênan û seqamgiriya bazarê gihand asta herî nizm. Di encamê de, bihayê diravê Îranî ber bi herifîneke wisa ve çû ku jiyana rojane ya xelkê tûşî şokê kir.

Di wê çarçoveyê de, serhildana mehên Rêbendanê wek erdhejeke siyasî û pêleke herifandinê derketin ku tê de girseya serhildanê, bêtirs û bi mukumî, seranserê hikûmetê kirin amanc.

Ji aliyê derve ve, rejîma Tehranê gihîşt bonbestekî dîrokî. Naskirina Spaha Pasdaran wek rêxistineke terorîstî ji aliyê Parlemana Ewropayê û di dawiyê de çalakkirina "Mîkanîzma Maşeyê", lêdanek bû li şademara dîplomasî û darayî ya kanalên ser bi dezgehên tepeserkar yên rejîmê.

Yek ji encamên vê qonaxê, lawazbûn û jihevketina zêdetir a tora hêzên proksî yên Komara Îslamî bû ku bi salan bi sedema talankirina xelkê birçî yê Îranê hatibûn amadekirin. Şikesta van projeyên derve ku di bin navê "kûrahiya stratejîk" de hatibûn rêkxistin, selmand ku ewlehiya hawerdekirî û şoreşa hinardekirî nikare rê li teqîna enerjiya pelixandî ya xelkê bêzarbûyî bigire.

Her di nav dilê vê şikestê de û di berdewamiya şer û milmilaneyên ligel Amerîka û Îsraîlê de, kuştina



Elî Xaminêyî wek stûna vê sîstemê, derbeke giran bû li seranserê vê rejîmê. Di rastiyê de kuştina Elî Xaminêyî tenê mirina dîktatorekî nebu, belku herifîna projeyeke siyasî û îdeolojîk bû ku li ser bingeha wehim, stemkarî û kavilkiriyê hatibû avakirin.

Di nav van guhertinan de, Rojhilatê Kurdistanê bi gotara Kurdistanî û platforma hevpeymaniya siyasî ya partiyên Kurdistana Îranê wek cemsereke yekgirtî û xwedî proje derket. Ev platform tenê rêkeftineke partiyî nîne, belku nexşerêyeke neteweyî ye.

Bizava neteweyî ya Kurdistanê, bextewariya xwe di bindestî, paşguhxistin û înkarkirina nasnameyên din de neditiye, belku pêdagirî li ser "kerameta mirov" û mafê tak û komî yê neteweyan kiriye. Ev platform bûye modelekî bihêz ji bo hemû herêmên neteweyî yên bindest ên Îranê da ku bi hev re dawî bi sedsalekê ji paşguhxistin û bêmafiyê bînin.

Geşeya siyasî û aborî ya paşerojê û bi saziyîkirina bingehên hikûmeteke sekular, demokratîk û federal, bi vê guhertina pêkhateyî ve girêdayî ye. Her cure hewlek ji bo derbasbûn bi ser daxwaziyên neteweyan an avakirina ezmûna navendgeriyê, tenê dibe sedema dubarebûna ezmûneke şikestxwaryî û nesermiyane.

Rojhilatê Kurdistanê bi hêzên siyasî yên têkoşer û civaka sivîl a hişyar û berpirsiyar, tevî hevpeymanên xwe yên li herêmên neteweyî yên din ên Îranê, di qonaxeke nû ya têkoşîn û hevxebatiyê de ne daku Îraneke nû û cuda ji ezmûna berê ava bikin.

Wek nerîteke siyasî ya Hizba Demokrat a Kurdistanê, em bawer in ku yekrêzî û tebayîya nav mala Kurd eslekî bingehîn e ji bo gihîştina bi armancên dîrokî û bi nirxe azadiyê.

Lewma, hevxebatî ligel neteweyên bindest ên nav coxrafiya Îranê jî wek prensîbeke neguher a siyasî ji bo çêkirina her cure hevpeymaniyekê dizanin.

Hevxebatî û hevçarenûsbûna neteweyên bindest li beramberî eqliyeta qorixçî û navendgera di her form û şêweyekê de be, em wek eslekî din ê xebat û têkoşîna xwe dizanin. Wêneya vê paşerojê di darêjtina siyasî û îdarî ya Îranê de, tenê bi têgihiştina hevpar û hevxebatiya hêzên azadîxwaz pêk tê.

Di dûrevaniya Newroza rizgariyê de, em rû dikin neteweya Kurd û hemû neteweyên bindest û azadîxwazên Îranê û dibêjin: Wextê yekrêziya meydanî û têkşikandina paşmayiyên rejîma Komara Îslamî ye. Di dawiyê de jî em daxwazê ji civaka sivîl, jinên pêşeng û ciwanên wêrek û çavnetirs ên Rojhilatê Kurdistanê dikin ku bi hişyariyê ve parastina ewlehiya navxweyî û destkeftên vê guhertina li pêş bikin.

Hatina cejna Remezanê û Newroza Kurdewarî li hemû xebatkar û evîndarên azadiyê, malbatên serbilind ên şehîdan, malbatên girtiyên siyasî û hemû rêvîngên rêya rizgariyê pîroz be.

**Hizba Demokrat a Kurdistana Îranê**
**Desteya Kargêrî**
**Newroza 2726 a Kurdî**

# (Peyama Newrozî ya Sekreterê Giştî yê Hizba Demokrat a Kurdistana Îranê)

## Mistefa Hicrî: Paşeroja Îranê di destê wan neteweyên bindest de ye ku bi salan e ji bo jiyan, azadî, rûmet û mafên xwe rabûne ser piyan.



**Hevniştimaniyên hêja!**
**Gelê azadîxwaz û berxwedêr ê Kurdistanê!**

Di demeke dîrokî de em ber bi sala nû ve diçin, Em di rewşekê de ne ku bingehên desthilatdarî û xîmê siyasî, ewlehî û îdeolojîk a Komara Îslamî ya Îranê gihîştiye xala dawî û hilweşînê. Dema guherîn û gihîştina hev a komek qeyran û tengasiyên kombûyî bi gelek rehend û rûdanên navxweyî û derveyî ve.

Sala 1404 wek sala hilweşîna wê koşka wehmî tê hesibandin ku rêjîma Komara Îslamî ji bo çendîn dehkan bi mebesta parastina desthilata xwe ya sererok û xwesepîn ava kiribûn. Ev qonax ne tenê guherîneke siyasî ya asayî ye, belku encama kombûna qeyranên pêkhateyî yên rejîmekê ye ku êdî şiyana bersivdana tu pirsên hestiyar ên serdemî nemaye.

Di vê demê de ku rejîm ji her aliyekî ve hatiye dorpêçkirin û di bin êrîş û fişarên piralî de ye, tevgera rizgarîxwaz a Kurdistanê û neteweyên bindest jî ji bo ji nû ve darêtina qebareya siyasî ya cografyaya siyasî ya Îranê li ber derfeteke dîrokî ne.

Ji milê leşkerî ve, şerê 12 rojî yê navbera rejîmê û Îsraîlê cihê balê ye. Rejîmek ku bi dehan salan samana welat ji bo projeya "hinardekirina şoreşê" û birêxistin û çekdarkirina komên niyabetî (proksî) û karên terorîstî xerç dikir, di yekem rûbirûbûna rasterast de nîşan da ku heta di parastina rêberan û navenda biryardana xwe de bêçare ye.

Têkçûna yekcarî ya pergala berevaniyê û kuştina fermandarên pile bilind ên Spaha Pasdaran û zanyarên etomî, hevsengiya hêzê bi zerara vê rejîmê guherand. Bombebarankirina saziyên etomî ji aliyê Amerîkayê ve û qebûlkirina agirbestê bêyî tu destkeft yan îmtiyazekê, nîşanên şikesteke mezin û valahiyeke ewlehî û îstîxbaratî bûn.

Piştî vê şikesta mezin, rejîm di cihê evê ku dênekê bide jiyan û guzeraniya xelkê bêzar bûyî, penah bir ber "aboriya tepeseriyê"; zêdekirina budceya dezgehên ewlehî û îstîxbaratî bi rêjeyeke berbiçav, di demekê de ku qeyrana aborî, hejarî û bêkarî gihîştibû astê herî bilind, nîşanderê wê bû ku parastin û mayîna rejîmê tenê ewlewiyeta rejîmê ye. Daketina nirxa dirafê Îranê, bû sedema teqîna nerazîbûnên girseyî di meha Rêbendanê de. Ev serhildan ku di şêwazê mangirtin (grev), xwepêşandan û derkeftina girseyî bo ser şeqaman de tevahiya Îranê girt, rûbirûbûneke aşkere ya navbera xelk û desthilatê bû.

Di vê navberê de, dezgehên tepeserkar ên rejîmê, bi avayê herî bê rehmane, dest avêtin kuştin, birîndarkirin û girtina dehan hezar kes ji xwepêşanderan. Rûdaneke girîng a din a sala 1404 di bîreweriya Kurdistaniyan de, mangirtina giştî ya Rojhilatê Kurdistanê bû.

Yêkrêzî û hawhêlwêstiya Rojhilatê Kurdistanê û beşdariya wan di vê mangirtinê de ji bo mehkûmkirina cinayetên rejîmê li Kurdistanê bi taybetî li navçeyên Kirmaşan, Îlam û Luristanê û herwiha piştgiriya nerazîbûnên seranserî yên Îranê, destkefteke siyasî ya Kurdistaniyan bû. Rojhilatê niştiman yêkparçe û yêkdeng, ew peyam gihand Komara Îslamî ku li hember reşekujî û kuştina lorîkên Kurdisztanê bêdeng nabe.

Li pey vê reşekujiyê û ji ber van serkutan bû ku Yêkîtiya Ewropayê jî biryareke dîrokî derxist û Spaha Pasdaran xiste nava lîsteya rêxistinên terorîstî de. Karakkirina "mîkanîzma maşê" ji aliyê Encumena Asayîşa Neteweyên Yêkbûyî ve, pêngaveke din bû ku rejîm bire bire nava qonaxeke nû.

Rejîm ku herdem pişta xwe bi stratejiya kirîna demê girêdabû, xwe di nav geraveke yasayî de dît. Ev ne tenê dorpêçeke aborî bû, belku dawîhatin bi derfeta danûstandinê digel rejîmekê bû ku wek karekterekî neberpirsyar di havkêşeyên navdewletî de lê tê nêrîn.

Ev li kunci asêkirina, nerasterast zemîne ji bo givaşa zêdetir bo ser rejîmê çê kir, ku di dawiyê de bi êrîşa hevbeş a Îsraîl û Amerîkayê ket qonaxa cîbicîkirinê ve.

Kirina armanc a hejmareke zêde ji berpirsên siyasî û fermandarên pilebilind, di serî de Elî Xamineyî, rêberê rejîmê, rewşa siyasî û ewlehî ya Komara Îslamî bir qonaxeke nûtir. Xamineyî wek istûna sereke ya rejîma Komara Îslamî ya Îranê di qopiyekê de ku ji bo xelkê Îranê û hemû Rojhilata Navîn pêk anîbû, ji nav çû û bat bû. Kesek ku temenek di nav xeyala "kûrahiya stratejîk" û "bereya miqawemetê" û "wehma etomî" de jiyabû.

Ev şerxwaziya rejîma Komara Îslamî bi hemû derencam û kawlkariyên xwe berdewam e, lê ewê ku di hizr û ramana xelkê de dimîne, ne serkeftin û ne berevaniya rejîmê ye, belku şikest, hilweşîn û avabûna desthilatekê ye ku her ji destpêkê ve diruşmê şer, jinavbirin, merg û nemanê ji bo yên din hildabû.

Îran li ber guherîneke çaverêkirî de ye. Paşeroja vî welatî di destê wan neteweyên bindest de ye ku bi salan e ji bo jiyan, azadî û rûmet û mafên xwe rabûne ser piyan. Pirsa sereke ya gelên bindest di vê cografyayê de, girêdayî pirsa neteweyî û ji nû ve darêtina Îranekê ye ku tê de mijara "navend û piştguhxistinê" dawî pê hatibe û hemû tevî parastina nasname û cudahiyên xwe, di îdarekirin û birêvebirina wê de wek hev beşdar bin.

Nerîta navendgerayî ku stratejiya parastina desthilata navend û yek ji wan Komara Îslamî bû, şikest xwariye û netewe ji wê hindê têgeheştine gihîştine ku mafê diyarkirina çarenivîs û cîgîrkirina sîstemeke federal, garantiyek ji bo seqamgirî û pêkvejiyana dilxwazane û aştîyane muyeser dike.

Di vê navberê de, Kurdistana Îranê bi sedema hişyariya siyasî û hebûna tevgereke resen û ezmûna birêxistinbûnê û civakeke pêşeng û xebatkar, di van guherînan de hêzeke bibandor e.

Me wek hêzên Kurdistanî, amadeyiya temam a xwe ji bo her cure hevkarî û têkoşîna hevbeş digel neteweyên bindest û azadîxwazên Îranî ragihandiye ku bibe sedema lezkirina proseya rûxana rejîmê û guhertina wê bi sîstemeke federal û demokratîk ku tê de mafê neteweyî, pirsa dêmokrasiyê, wekhevî û azadî hatibin naskirin.

Em rû li cemawerê têkoşer ê Rojhilatê Kurdistanê û hemû neteweyên bindest û hemû azadîxwazên Îranê dikin û dibêjin: Bivêrî û îradeya we ya polayîn di vê qonaxê de, ji her demê zêdetir rol dibîne.

Erkê dîrokî ya hemû têkoşeran, aliyên siyasî û azadîxwazan e ku bi yêkgirtî û hişyariyê ve xwe ji bo qonaxa rûxana rejîmê û qonaxa piştî wê amade bikin. Hizba Demokrat a Kurdistana Îranê, bi têgihîştina ji kûrahiya van guherînan, pêdagiriyê dike li ser gotara Kurdistanî û hevxebatiyê û di vê derheqê de berpirsyariya xwe ya dîrokî li ber çavan digire.

Di peywendî bi Newrozê de, ku bi hêvî ne Newroza rizgariyê be, ev boneye her sal me Kurdan dibe ser serhildaneke neteweyî dijî zordariyê û peşqel û guriya agir dibe nîşana serkeftina bi ser tariyê de û mizgîniya serkeftin û azadiyê dide me.

Li vir de, ez pîrozbahiya cejna Newrozê dibêjime hemû Îraniyên azadîxwaz, Kurdistaniyên berxwedêr, malbatên serbilind ên şehîdan û zindaniyên siyasî, hêza bihêz a Pêşmerge û hemû çîn û beşên civaka Kurdistanê.
Bi hêviya serkeftinê.

**Sekreterê Giştî yê Hizba Demokrat a Kurdistana Îranê**
**Mistefa Hicrî**
**Newroza 1405 a Rojî**

# Peyama Hevpeymaniya Hêzên Siyasî yên Kurdistana Îranê ji bo netewe û hemû azadîxwazên Îranê, netewa Tirkê Azerbaycanê û welatên cîran

## Netewên bindest û hemû azadîxwazên seranserê

Hevpeymaniya Hêzên Siyasî yên Kurdistana Îranê di vê qonaxa hestiyar a têkoşînê de, bi piştgirêdan bi dîroka têkoşîna xwe û prensîpên têkoşîna tevgera neteweyî û demokrasî a Kurdistanê, û bi têgihiştina berpirsayetiya xwe ya dîrokî di şert û mercên hestiyar ên îroye Îranê de, careke din tekeziyê li ser hewcehiya hevdengî û yekîtiya di navbera hemû hêzên azadîxwaz û netewên bin dest yên welat de dike, ji bo derbasbûn ji bindestiyê û avakirina pêşerojeke demokratîk.

Em li ser vê baverê ne ku pêşerojeke domdar ji bo Îranê tenê di bin siya cihgîrkirina sîstemekî demokratîk de, ku li ser bingeha nasandina mafên neteweyî yên netewan, dadperwerî û wekheviyê, û garantîkirina azadiyên bingehîn yên welatiyan ava dibe.

Hevpeymaniya Hêzên Siyasî yên Kurdistana Îranê di vê pêxemê de amadebûna xwe ji bo hevkarî û hevgirtina bi hemû hêzên siyasî û civakî yên demokrasîxwaz ji bo avakirina Îraneke azad, demokratîk û pirneteweyî radigihîne.

**Xwişk û birayên Azerî!**

Em ji vê rastiya dîrokî agehdarin ku di hejmarek bajar û herêman de, bi taybetî li Azerbaycanê û Kurdistanê, Azerî û Kurd bi dirêjahiya dîrokê de li kêleka hev jiyane. Pêşeroja van herêman divê li ser bingeha hevkarî, rêvebirina hevpar û garantîkirina mafên wekhev ên hemû civakê bê ava kirin.

Di van herêmanên têkel de, Hevpeymaniya Hizbên Kurdistana Îranê piştgîriya avakirina mekanîzma rêvebirina hevpar a herêmî ku rengvedana pêkhateya xelkê herêmê be dike.

Hevpeymaniya Kurdistanê li ser vê baverê ye ku ewlehî û aramiya berdewam tenê di demekê de pêk tê ku hemû netewên deverê, çi Kurd bin çi Tirk, li Azerbaycan û Kurdistanê û herêmên din, xwediyê mafên siyasî, çandî û zimanî yên wekhev bin û rêvebirina karûbarên herêmî bi rêya saziyên demokratîk û bersivdar bên encam dan.

Em wek hemîşe destê hevkariyê ber bi netewa Tirkê Azerî û hêzên siyasiye wê dirêj dikin û amadebûna xwe ji bo diyalog, hevahengî û afirandina mekanîzmayên ku ewlehiya giştî û aramiya herêmên hevpar garantî bike, radigihînin.

Pêşeroja herêmê divê li ser bingeha pevrejiyanê, rêzgirtina hevdu û beşdariya wekhev a hemû netewan bê ava kirin.

Herwisa bi tekezî kirin li ser pêywendiya dîrokî û civakî a di navbera netewa Kurd û netewa Tirkê Azerî de, em bawer in ku pêşeroja pêywendiyên di navbera van her du netewan de divê li ser bingeha diyalogê, rêzgirtina hevdu û pevrejiyana aştiyane ava bibe.

Di vê çarçoveyê de, em careke din pabendbûna xwe bi mifad û riha Peymana dostiyê ya di navbera Komara Kurdistanê û Hikûmeta Neteweyî ya Azerbaycanê de radigehînin û wê wek nexşerê û nîşaneyek ji hevkarî û têgehiştina di navbera tevgerên demokratîk yên Kurdistanê û Azerbaycanê de dibînin.

Hevpeymaniya Hêzên Siyasî yên Kurdistana Îranê di berdewamiya rêya xwe de, xurtkirina hevkariyê di navbera hêzên demokrasîxwaz de û berfirehkirina diyalogê di navbera neteweyan de, û herwisa afirandina mekanîzmên hevpar ji bo pevrejiyana dadperwerane, wek bingehên sereke yên gihîştina bi pêşerojeke azad û dadperwer ji bo hemû netewên Îranê dibîne û di vê rê de ji pêşwaziyê ji her cure hevkarî û hewldanê dike.

Hevpeymaniya Hêzên Siyasî yên Kurdistana Îranê di pêywendî digel netewe û welatên cîran re, li ser prensîba pevrejiyana aştiyane, cîranîya baş û rêzgirtina berjewendiyên rewa yên hevdu bi hemû welatên herêmê re tekezî dike. Em li ser vê baverê ne ku aşitî û aramiya herêmî tenê bi rêya diyalogê, hevkariyê û rêzgirtina hevdu di navbera netewe û dewletan de xurt dibin.

**Hevpeymaniya Hêzên Siyasî yên Kurdistana Îranê**
**14ê Adara 2026 a Zayînî**

## Peyama Newrozî a Hevpeymaniya Hêzên Siyasî yên Kurdistana Îranê




**Gelê xebatkar ê Kurdistanê!**
**Azadîxwaz û rêvîngên rêya azadiyê!**

Newroz ji bo Kurdan ne tenê werza nûbûna xwezayê ye, belku sembola xebat û xweragirtinê, rabûn û vejînê ye. Merasimên Newrozê li Rojhilatê Kurdistanê ji mêj ve bûne fersendek ji bo rabûna li dijî siyaset û nerîtên Komara Îslamî, her sal xelkê Kurdistanê bi hîmeta xwe ya çiyayî û xweragirtina xwe ya mêrxasane û bêdawî, daxwaz û îradeya rejîmê xistine qedema. Destkeftiyên civaka medenî di birêvebirina merasimên girseyî ye Newrozê de girîng û bi nirx bûn, destkeftiyek ku encama xebat û berxwedaneke dûrudirêj û bêwestan a bi dehan salan a gelê Kurd û hêzên wê yên siyasî ye, yên ku li hember ti cure zext û serkutkirinê û bikaranîna her cure siyaset û pîlanên Komara Îslamî serê xwe netewandine û dev ji xebatê bernedane.

**Xelkê xebatkar ê Kurdistanê!**

Em rojên dawî yên îsal di demekê de derbas dikin ku Komara Îslamî ya Îranê agirê şerekî herêmî pê xistiye. Beriya wî şerî jî, bi hezaran xwepêşanderên nerazî li ser şeqamên Kurdistanê û bajarên din ên Îranê kuştin û bi hezaran kesên din jî xistin zindanan. Ev yek ligel berdewamiya binpêkirina sîstematîk a hemû mafên siyasî, neteweyî û medenî yên Kurdan e, ku bi vî awayî jiyana Kurdan li ser ax û nîştimanê wan kiriye dozex. Her niha jî ku ji ber siyasetên xwe yên şaş, piştgirîkirina terorîzma dewletî û têkdana aramî û îstîkrara navçeyê û cîhanê şerekî mezin daye destpêkirin, her roj bingeh û baregehên partiyên siyasî yên Rojhilatê Kurdistanê bi mûşek û dironan dike armanc, bi wê mebest û xeyalê ku rêya xebat û têkoşîna rizgariyê li wan bigire. Bi tekezî ev êrîş hilopepkaniya dawî yên rejîmê ne di qonaxa canedanê de, ev ne nîşana bihêzbûnê, belku nîşana bêçarebûn û perîşaniya wê ne.

Newroza îsal ji bo xelkê Kurdistanê mizgîniya serkeftineke mezin e. Ji aliyekî ve partiyên wan ên xebatkar di çarçoveya hevpeymaniyeke siyasî de hêz û enerjiya xwe ya xebatê rêk xistine, ji aliyê din ve jî hemû çîn û qatên civaka Kurdistanê, bi taybetî jinan bi biryardarî û mukumiyeke mezin pişkeke zêdetir xistine ser xermana destkeftên xebata me ya mafxwazane.

Di devedevê Newrozê de, careke din em xelkê Kurdistanê xatircem dikin ku ne moşekbaran û teror, û ne jî ti cure zextên siyasî û ewlehî û givaşek, gavên me sist nakin. Herwisa bi yêkrêzî û hevpeymaniya siyasî ya partiyên siyasî yên Rojhilatê Kurdistanê, em gavan diavêjin bo nava qonaxeke nû di xebat û têkoşîna xwe ya hevpar de, ku hiviyên serkeftinê ji bo me nêzîktir û rontir dike.

Ligel pîrozkirina Newrozê û hatina sala nû li xelkê Kurdistanê û nûkirina peymana wefayê bi şehîdên Kurdistanê re, bi taybetî şehîdên vê dawiyê yên serhildana Befranbarê li Kirmaşan, Îlam û navçeyên xwarê yên Kurdistanê û her wiha qurbaniyên êrîşên mûşekî yên Komara Îslamî, em bang li xelkê Kurdistanê bi hemû çîn û qatan dikin ku di xebat û têkoşîna xwe de li dijî Komara Îslamî berdewam bin û di qonaxa hestiyar a niha de parêzvanên destkeftên xebata bi dehan salên borî bin.

Di Newroza îsal de, em peymana xebat û xweragirtinê nû dikin, bi serdana malbatên şehîdan, em yad û navê kurên mêrxas ên nîştimana xwe bilind radigirin û bi tekezkirina li ser ruhê yekgirtin û hevpeymaniyê, ber bi gupka serkeftinê ve gavan diavêjin.

**Hevpeymaniya Hêzên Siyasî yên Kurdistana Îranê**
**Newroza 2726an a Kurdî**

# Êvara Ayetullahan: Tektonîka Jeopolîtîk û Hişyariya Kurdî



N. Dr. Mecîd Heqî

Dibe ku dîroknas roja 28'ê Sibata 2026'an wekî dawiya tecrubeya teokratîk a herî mayînde ya sedsala 20'an tomar bikin.

Di operasyoneke leşkerî ya hevaheng û birûskî de, Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê û Îsraîlê operasyoneke "bêserîkirinê" (decapitation strike) li dijî bingeha Komara Îslamî ya Îranê pêk anîn.

Di nava çend saetan de, desthilatdariya mutleq a Rêberê Bilind Elî Xameneyî, tevî çil berpirsên pilebilind ên leşkerî û siyasî yên rejîmê, hat hilweşandin.

Lê hilweşîn li wir nesekinî. Di 17'ê Adarê de, bermayiyên fermandariya stratejîk a rejîmê bi kuştina Elî Larîcanî, Serokê Encumena Ewlekariya Neteweyî, û Xulamriza Silêmanî, Fermandarê Besîc, hîn bêtir lawaz bûn.

Ev bûyer ne tenê dawiya serdemeke 47-salî ya desthilatdariya melayan nîşan didin, lê di heman demê de agirê jeopolîtîk ê ku nexşeya Rojhilata Navîn û bazara enerjiya cîhanî ji nû ve ava dike, geş kirine.

**Dorpêça Aborî: Hormuz, Neft û Krîza Cîhanî**

Sê hefte ne ku cîhan nefesa xwe girtiye, ji ber ku rûbirûbûna di navbera Tehran, Washington û Orşelîmê de ji şerê wekaletê derbasî şerekî eşkere û tevahî bûye.

Rejîma ku li ber mirinê ye, wekî hewildana dawî ya man û nemanê, fermana girtina Tengava Hormuzê da. Ev pêngav—ku wekî "vebijarka atomî" ya bazirganiya deryayî tê naskirin—şokên mezin gihandin aboriya cîhanê.

Bihayê neftê gihîşt astên nedîtî û krîzeke gihandina enerjiyê da destpêkirin ku aramiya welatên pîşesazî dixe metirsiyê.

Ji bo Ewropa û welatên pêşkeftî yên Rojhilat, dorpêçkirina vê damara sereke, şerekî herêmî veguherand rewşekî awarte ya aboriya navxweyî. Lê belê, ev kaos berhema tal a stratejiyeke nîv sedsalî ye.

Ji sala 1979'an vir ve, hebûna Komara Îslamî li ser dirûşma "Mirin ji bo Amerîkayê" û armanca sîstematîk a ji holê rakirina Îsraîlê hatibû avakirin.

**Rêya Ber bi Kendavê: Ji 7'ê Cotmehê heta Hezîrana 2025'an**

Hilweşîna niha ne qezayek ji nişka ve bû, lê encama zincîreyeke (zîncîreyeke) têkçûnên stratejîk ên Tehranê bû. "Serdema Nû" ya pevçûnê di 7'ê Cotmeha 2023'an de bi êrîşên Hemasê yên li ser Îsraîlê dest pê kir—qumarek ku bi piştgiriya îstîxbarata Îranê hatibû kirin, lê di dawiyê de li dijî wan vegerî.

Di salên piştî wê de, "Eniya Berxwedanê" dest bi hilweşînê kir. Ketina rejîma Esed li Sûriyê, ku bingeha sereke ya Tehranê ya herêmî bû, domînoya yekem bû.

Piştî wê, lawazkirina sîstematîk a Hîzbullahê li Lubnanê û têkçûna fonksiyonel a Hemasê li Xezeyê hat.

Şerê 12-rojî yê Hezîrana 2025'an hişyariya dawî bû; lê belê, serhişkiya rejîmê ya li ser bernameya atomî û gefên wê yên berdewam li ser berjewendiyên Rojava, bûyerên 28'ê Sibatê kirin tiştekî neçarî. Komara Îslamî li şûna reforman, şewitandina mala xwe hilbijart.

**Faktora Kurdî: Hêzeke Nû di "Roja Piştî" de**

Gava ku desthilatdariya navendî li Tehranê hildiweşe û amûrên tepeserkirinê yên Pasdaran (SPAS)—ku bi dehsalan ji bo fetisandina gelên Îranê dihatin bikaranîn—ji holê radibin, valahiyek çêbûye.

Di vê valahiyê de, lîstikvanên herî birêxistinkirî, xweragir û ji aliyê siyasî ve amade, neteweyên bindest ên Îranê ne. Di serê wan de jî neteweya Kurd tê.

Ji bo Kurdan, rûxandina baregehên leşkerî û navendên ewlehiyê yên rejîmê li Rojhilatê Kurdistanê, ji guhertineke leşkerî wêdetir e; vebûneke dîrokî ye.

Tevgera Kurd êdî ne mijarek marjînal e; ew bûye faktorekî navendî di diyarkirina nexşeya siyasî ya pêşerojê ya Îranê de.



Çend roj beriya êrîşên 28'ê Sibatê, bi pêngaveke dûrbînane, partiyên siyasî yên Rojhilatê Kurdistanê Hevpeymaniya Hêzên Siyasî yên Kurdistana Îranê ava kirin.
Ev yekîtî ne tenê hevalbendiyek taktîkî bû, lê daxuyaniyeke stratejîk a amadebaşiyê bû.

Vê yekê ji cîhanê û gelên Îranê re peyam da ku Kurd amade ne ji bo birêvebirinê, parastina axa xwe û beşdarbûna di pêşerojeke demokratîk û nenavendî (federal) de.

**Nakokiyên Navxweyî: Navendparêz li dijî Pluralîstan**

Rabûna Hevpeymaniya Kurdî bi coşeke mezin li seranserê Kurdistanê û di nav neteweyên din ên bindest ên Îranê de hat pêşwazîkirin.

Ev pêngav modelekê ji bo civakeke federal û pirreng pêşkêş dike, ku tê de maf ne ji aliyê dîktatorekî navendî ve tên dayîn, lê mafên xwezayî yên gelan in.

Lê belê, vê dînamîka Kurdî bertekên neteweperestên "navendparêz" û Pehlewîstan jî rakir.

Ew kesên ku xeyala vegera serdemekî şahînşahî ya Faris-navend dikin, bi guman li yekîtiya Kurdan dinêrin.

Pevçûna di navbera alîgirên "Îraneke Federal a Nû" û parêzvanên sîstemên navendparêz ên kevin de, dibe nakokiya sereke ya navxweyî ya şoreşê.

Tevgera Kurd niha bi dijwariya parastina vê hevsengiyê re rû bi rû ye.

Kurd bi hevahengkirina berjewendiyên xwe yên neteweyî bi armancên stratejîk ên hêzên navneteweyî re, xwe wekî hevkarên herî pêbawer ji bo aramiya herêmê nîşan didin.

Ew tiştekî pêşkêşî civaka navneteweyî dikin ku teokratan qet nekir: Hevalbendekî demokratîk ku pabendî aştiya herêmî û serweriya qanûnê ye.

**Berpirsiyariya Rojavayê**

Gava ku Parîs, Washington û London li dûmana ku ji xirbeyên Komara Îslamî radibe dinêrin, dibe ku bikevin bin bandora xeyala tenê fikirîna li ser bihayê neftê an ewlehiya Tengava Hormuzê. Ev ê bibe xeletiyek dîrokî.

Çîroka rastî ya sala 2026'an, ji dayikbûna perstgehekî (landscape) nû yê siyasî ye. Gelê Kurd nîşan da ku ew "faktorekî bihêz û bibandor" in di ji nû ve sêwirandina Rojhilata Navîn de.

Cara yekem di nîv sedsalî de, îhtîmala Îraneke demokratîk realîst e, lê ev tenê gava pêkan e ku mafên neteweyên wê yên cihêreng—Kurd, Belûç, Azerî û yên din—were mîsogerkirin.

Serdema "Şahê Şahan" û "Rêberê Bilind" bi dawî bû.
Serdema gelan, bi pêşengiya vîna birêxistinkirî ya tevgera Kurd, dest pê kiriye.

Divê civaka navneteweyî niha biryar bide: Ma ew ê piştgiriya demokrasiyeke nû û federal bikin, an ê rê bidin ku ruhên navendparêziyê herêmê dîsa bixin nava xeleka tîraniyê?

# Hevpeymaniya siyasî ya Kurdan li Rojhilatê Kurdistanê, daxuyaniyeke nû ji hêz û serkewtinê



N. Serbest Urmiye




Ragihandina hevpeymaniya siyasî ya di navbera partiyên siyasî û azadîxwaz ên Kurd li Rojhilatê Kurdistanê, di demekê de ku pêşeroj û asoya siyasî ya Îranê di rewşeke nediyar de derbas dibe, ne hilkefteke rêxistinî ye; belkû daxuyaniyeke siyasî ya girîng e.

daxuyaniya bizavekê ye ku xuya dike ku hêza Kurd li Rojhilatê Kurdistanê ji qonaxa parçebûnê derbas bibe û ber bi kiriyareke siyasî ya nû ve diçe.

Bizavek e ku pêgeha gelê Kurd di hevbeşiya meydanî û ewlehiyê de derbas dike û dike hevparê siyasî û yasayî di herêmê de.

Bi eşkere radigihîne ku armanc şopandina vê çendê ye ku opozîsyona siyasî ya Kurd bike hevparê siyasî û yasayî di Îrana piştî nemana rejîma Îslamî de.

Gihîştin bi armanceke siyasî ya wiha jî, pêdiviyê bingehek teorîk a zelal û stratejiyeke hevgirtî ye. Bervajî hevpeymaniya han dê tenê weke sembolek siyasî bimîne û sermayeya xwe ya civakî û meydanî winda bike.

Ezmûnên herêmî waneyên girîng in ji bo hevpeymaniya han. Li Başûrê Kurdistanê û piştî 2003`an, yekîtiya navxweyî û hevpeymaniyên neteweyî di kêleka beşdariya meydanî de, destkewtên mezin bo gelê Kurd bidestxistin.

Misogerkirina esla federalîzmê û naskirina Herêma Kurdistanê ji encamên vî serdemî bûn, lê referandoma 2017`an da xuyakirin ku nemana hevsengiya bi bandor a hêzê dikare bihayeke giran a siyasî û aborî hebe.

Li Rojavayê welat jî, her çend rêveberiya xweser a Kurdan di qonaxeke girîn de xwedî bandor bû, lê lihnevkirin û bi hev re netifaqiya neteweyî û girêdayîbûna ewlehiyê bi hêzên bîhanî ve di şûna hêzên navxweî de, nîşaneya lawaziyê bûn. Peyam eşkere ye: hêza meydanî dûr ji yekîtî û piştevaniya neteweyî ya berdewam bê encamp e.

Di Îranê de rewşeke cuda heye ku ezmûnên Başûr û Rojavayê Kurdistanê li hember dewletên Îraq û Sûriyê de, ber bi rûyê hin arişeyan dike.

Ev jî bi sedema hebûna pêkhateyên neteweyî, civakî û siyasî yên cuda û hesasiyeta opozîsyona tevahîxwaz ya xwe bi seranserî zan e li hember pirsa bê şirove a yekîtiy axê li hember perçebûna Îranê de ku her di serî de mînaka Îraq û Sûriye ret dikin.

Di rewşeke wiha de heke hevpeymaniya siyasî ya Kurd li Rojhilatê Kurdistanê bixwaze di Îrana piştî rejîma Îslamî de bibe hevpar û şirîkê damezirîner, hewce ye ku di şûna vê çendê de ku bi tenê xwe girêde rewşa heyî û bûyerên rojevê bişopîne, pirojeyek demdirêj û stratejîk ji refom û damezirandina sîstemeke nû pêşkêş bike ku garantiya hêza Kurd weke hevparê siyasî û yasayî bike.

Weke mînak dibe ku modeleke bihêz ji destûra bingehîn, dabeşkirina desthilatê û reforma aborî pêşkeş bike ku tê de bide selimandin ku Kurd di Îranê de ne lîstikvanên şanoyên herêmî, belkû hêz û îradeyeke hevpar in bo serkewtinê.

**Ji bo serkewtina hevpeymaniya Kurdan, hewce ye ku:**

**1.** ji hemiyan girîngtir Meşrûîyeta neyeweyî: divêt ku hevpyemanên han nûnerayetiya civaka xwe bikin. Mikanîzmeke zelal di warê biriyargirtinr de pêşkeş bikin û li dor pirs û bernameyên giştî yekdeng, yek helwest û bersivder bin. Heke ne, her rêkevtineke xweser li derveyî hevpeymaniyê dê bingeha navxweyî hilweşîne.

**2.** Çarçoveya daxwazên neteweyî: dibe ku hevpeyman li ser nenavendîkirina Îranê hevbiriyar bin û xurtkirina civatên herêmî, dabeşkirina dadperwerane ya bûdjeya welat, misogerkirina mafên neteweyî ,zimanî, çandî û ... weke reformên bingehîn bidin pejirandin, ne weke îmtiyazek taybetî ji bo herêmekê.

**3.** Hebûn di pêvajoya derbasbûnê ji sîsyema niha de: Di darêtina yasayan û destûra bingehîn de, hevpeymaên Kurd dibe ku bibin hevparên çalak. Nebûn yan lawazbûna wan di vê qonaxê de, dê herî kêm bibe sedema bêbandor yan kêmbandor bûna wan di qonaxên paştir de.

**4.** hevbendî li ser bingeha serxwebûna hevpeymaniyê bi hêzên cîhanî re: divê ku di peywendiyên siyasî û dîplomatîk de tekez li ser serxwebûna biryardanê were kirin û ji hevalbendiyên demkurt û ewlehiyê ku bibin sedema lawazkirina serxwebûna biryardanê dûr kevin.

**5.** Misogerkirina tenahiyê di herêmê de: hevpeymanî dibe bikare di herêmê de tenahî, xizmetên giştî û mafê kêmaniyên din yên herêma Kurdistanê di kêleka gelê Kurd misoger bike.

Bi vî halî jî, hevpeymaniya hêzên siyasî yên Rojhilatê Kurdistanê bi hin pirsgirêkan re ber bi rû ye. xwestek yan zêdexwaziya ne rêk û pêk, dibe sedema yekgirtina zêdetir a dijberan li dijî vê hevpeymaniyê.

Herwiha parçebûna hindurîn ya hêzên hevpeyman, giraniya siyasî ya wan kêm dike û man yan derbas nebûn di çarçoveya ewlehiyê yan dûreperêziyê de jî metisiyê dixe ser destkevtên siyasî.

Pilana çareser û zanistî, manîfesta veguhastinê ye bi tewerên bihêz û zelal re, rêkxistina konseya hevahengiyê di navbera partiyên siyasî de, danûstandinên erênî bi hêzên din ên opozîsyonê re û parastina kanalên dîplomatîk yên serbixwe ye.

Di dawiyê de, heke hevpeymaniya hêzên siyasî yên Rojhilatê Kurdistanê nebe navenda rêkxistin û darêtina stratejiyên tevalî û di kiryar de lawaz derkeve, ragihandina vê tenê dibe nûçeyek di medyayê de.

Lê ezmûnên herêmê bi taybetî di Rojava û Başûrê Kurdistanê, Sûriyê û Îraqê de, formolekiroina rast û aqilane a xwestekên neteweyî di reform û pêkhateya giştî de û parastina serxwebûna siyasî, dikare pêgeha hevpeymaniya han ji hebeşiya meydanî ve veguhêze hevbeşiya siyasî û yasayî di Îrana piştî rejîma Îslamî de.

## Nerîna



**“Miŝtefa Hicrî”:**

**“Paşeroja Îranê di destê wan neteweyên bindest de ye ku bi salan e ji bo jiyan, azadî, rûmet û mafên xwe rabûne ser piyan.”**



**“Binyamîn Netanyaho”:**

**“Komara Îslamî wek dareke rizî li ber hilweşînê ye.”**



**“zelensky”:**

**“Bi jiholêrakirina vê rejîma terorîst a hovane, Îran dikare bibe civakek aştîxwaz û serfiraz.”**



**“Êmanoêl Makron” :**

**“Min daxwaz ji Pizîşkiyan kiriye ku dawiyê bi wan êrîşan bîne ku Îran dijî welatên deverê, çi bi awayê rastewxwe yan li rêya hêzên niyabêtî encamp dide”**

# «Belkî»ya Trump li ser guhertina sînoran, gelo Rojhilata Navîn li ber guhertina mezin e?



N. Eskender Ceiferî



Daxuyaniyên dawî yên Donald Trmp serkomarê Amêrîka di bersiva pirsa rojnamevanekî de li ser egera guhertina nexşeya Îranê piştî şerê bi rêjîma Îranê re, careke din nîqaşên li ser jêopolîtîka herêmê vejandin.

Di bersiva pirsa ku gelo dibe ku piştî şer sînorên Îranê bêne guhertin de, wî got: “belkî, erê.” ev “belkî”ya kurt ji bo çavdêrên siyasî, dezgehên ragehandinê û aktorên herêmî bes bû ku sênaryoyên cûrbicûr danîn ser maseyê?

Niha, mijara egera guhertina sînoran dîsa bûye rojev. Di salên dawî de, her ku aloziyên di navbera Tehran û Waşingtonê de zêde bûne, mijara guhertina hevsengiya hêzê li Rojhilata Navîn jî bêtir derketiye holê.

Desthilatdarên dewletên Yekbûyî yên Amêrîka her gav tekez kirine ku armanca wan “guhertina reftara Îranê”ye, ne “guhertina rêjîmê”, lê gotinên hin kesatiyên siyasî, di nav de Trump, pir caran hêla di navbera her du têgehan de diguhere. Niha Trump dibêje ku ew, guhertina rêjîmê dixwaze.

Li Ewropayê jî, rayedar bi gelemperî alîgrê parastina yekparçeyiya axa welatan in. Yekîtya Ewropayê bi berdewamî tekez li ser aramiya sînorên navnetewî kiriye û li dijî têkdana aramiya herêmê hişyarî daye.

Rûsya û Çîn, wekî lîstikvanên bi bandor, guhertina nexşeyên siyasî bi rêya şer wekî hêla xwe ya sor dibînin, helwestek ku li ser tevgerên serbixwexwaziyê hevnerîn e.

Di vê navberê de, navê Kurdan careke din di analîzê de tê bilindkirin. Kurdistan di ser Îran, Îraq, Tirkiye û Sûriyê de dabeş bûye, û bi dehan salan e hin tevgerên siyasî yên Kurd piştgiriya ramana serxwebûnê dikin.

Li Îraqê, herêmek bi navê Herêma Kurdistanê ji sala 1991-an ve bi awayekî dêfakto hebû ku piştî 2003-an jî bû fêdêral. Rêfrandûma serxwebûnê ya 2017-an nîşan da ku praniya xelkê Herêma Kurdistanê piştgiriya serxwebûnê dikin, her çend givaşên Bexdayê û dijatiya hin welatên herêmî û navnetewî rê li ber ragihandina serxwebûnê girt.

Sala 2004ê li welat û derveyî welat wajo hatibûn komkirin ku Kurd dixwazin serbixwe bibin. Wê demê 1 milyon 700 hezar wajo hatin komkirin û radestî Neteweyen Yekbûyî hatin kirin.

Her wisa di kanûna paşîn a 2005ê de jî referandûmeke nefermî hatiye kirin ku nîşan da piraniya Kurdan serxwebûnê dixwazin.

Piştre gihişte asta giştpirsiya serxwebûnê. 30ê adara 2017an, serokê Herêma Kurdistanê Mesud Barzanî li Hewlêrê pêşwaziya sekreterê giştî yê rêxistina Neteweyên Yekgirtî António Guterres kir. Rêfrandom hat kirin, lê Bexdayê rê li ber serxwebûna Kurdan girt.

Hin çavdêr dibêjn heger rêjîma Îranê bê helweşandin an jî pêkhateya wê ya siyasî veguherînek bingehîn derbas bike, hevsengiya hêzê li herêmê dê bi awayekî bingehîn bê guherîn.

Di rewşek wisa de, dibe ku Başûrê Kurdistanê hest bike ku gavek nêzîktirî pêkanîna xewna xwe ya serxwebûnê bûye, ji bo mînak heke Bexda ji dest bêt, ji nû ve pênasekirina desthilata hêza navxweyî bike û hêzên herêmî jî bêne guhertin.

Lêbelê, serxwebûna Başûrê Kurdistanê ne tenê bi rewşa Îranê ve grêdayî ye. Tirkiye, wekî cîranek bihêz, her gav bi hişyarî li hember avakirina dewletek serbixwe ya Kurdî li ser sînorên xwe tevgerê dike.

Wekî din, aboriya Başûrê Kurdistanê, bi giranî bi hinardekirina petrolê bi rêya axa Tirkiyê û têkiliya bi Bexdayê re girêdayî ye.

Tevî vê yekê, heke Kurd bikarin piştgiriya Trump yan Îsraîlê bi dest bînin, Tirkiye nikare bibe astengiyek mezin ji bo serxwebûna Basûrê Kurdistanê.

Ji aliyekî din ve, civaka navnetewî bi gelemperî piştgiriyê nade ji bo guhertina sînoran bi rêya şer.

Li gor baweriya Îran û Tirkiyê, helweşîna ji nişka ve ya hikûmetan pir caran dibe sedema valahyên hêzê, pêşwaziya çekdarî û destwerdana biyanî, rewşek ku dikare armancên wan du desthilatan jî asteng bike.

Gotnên Trump, nêrîna beşek ji hêza siyasî ya Amêrîka nîşan dide ku Amêrîka, guhertinên jêopolîtîk wekî rêyek ji bo kontrolkirina hevrikan dibîne. Lêbelê, guhertina sînoran li Rojhilata Navîn hewceyê hevgirtina navxweyî, têkeliyên navçeyî û navnetewî ye.

Ji bo Başûrê Kurdistanê, her guhertinek mezin li Îranê dikare derfet û gefên nû çê ke, lê serxwebûn, hewceyê lihevkirina navxweyî, garantiyên herêmî û piştgiriya navnetewî ye.

Li navçeyekê ku dîroka wê bi hêlên sînorên avakirî bi şeran girêdayî ye, her “belkî”ya siyasî dikare encamên mezin li pey xwe ve bîne.

# Hevpeyvîna me ya vê carê digel rêzdar Hesen Şerefî Endamê Desteya Kargêrî a PDKÎ li ser rewşa şer û paşeroja netewan li Îranek din de



Hevpeyvîm: Hesen Şerefî
Hevpeyvînkar: Sîmîn Rûhanîzadeh

**1- Kek Hesen Şerefî pirsa min a yekem li derheq rewşa niha a herêmî ye ku ber bi çi aliyekê ve diçe?**

Em dikarin rewşa niha bi du awayî behs bikin rewşek evaye ku Kurdistan ji berê ve di nav de ye û li dijî Komara Îslamî xebat dike bo çêbûna demokrasî û dabînkirna mafê neteweyî û mafê mirovî û ji bo jinavbirina cudahî danîna di navbera neteweyan ji bo wekheviya jin û mêran di nav civak û malbatê de û em gelek mêjve xebat dikin û bi li hatina ser kar a Komara Îslamiya Îranê ku me her di destpêkê de deng nedabû bi vê rejîmê û ne jî me xwastiye ev rejîma bê ser kar, û dema ku wisa ye em her li destpêkê de li hember vê rejîmê de li têkoşînê de bûne û xebata me hertima xebatek medenî û dûr li tûndtîjî û xwînrêjî bûye lê mixabin ji ber ku komara Îslamî tu carî nekariye û ne jî dikare demokrasiyê çê bike û nekariye wekheviya jin û mêran bawerî pê hebe û ne jî kariye dan bi mafê mirov û mafê netweyan bike. Dema ku wihaye Kurdistan her di destpêkê heta niha bi awayeke tewaw li dijî rejîma Komara Îslamî bûye û gelek hatiye serkutkirin û rêberên vê hatine terorkirin û hejmareke zêde li endam û pêşmegeyên Kurdistanl ji aliyê Komara Îslamî ve hatine terorkirin û êrîş li dijî Kurdistanê hatiye kirin û fitwa li dijî Kurdistanê hatiye dan û ev rewşa her berdewam bûye û lê rewşek din heye û di wan dawiyanê de hatiye gorê eve em hevdem xebata xwe li dijî Komata Îslamî didomînin û reftara Komara Îslamî jî hevdem digel neteweyên vê û xelkê vê dujmnane bûye digel welatên cîran jî herwisa dijmnane bûye û digel welatên dûr û nêzîk jî herwisa bûye bo mînak diroşma jinavbirina Îsraîlê dide û diroşma dijmnayetiya digel Amerîkayê daye û li dijî berjewendiyên Amerîka li navçê de kar kiriye. Û encama vê siyasetê ku di navçê de terorîsim berfireh kiriye û di navçê de alozî afirandiye û bi mifah wergirtin li hestên olî ji alîgirên Şîe meseb di welatên din de girûpên niyabetî çê kirine hemû ev siyasetên han bûne sebeba vê yekê ku dewletên han li hember de helwest hebin û pir caran hewl dane ku li rêya gotûbêjan ve Komara Îslamî bigihînin vê qinaetê ku dev ji van alozî û terorîsmê berde û bawerî bi mafên mirovan hebe lê tu feydeyek tunebûye û ev her bi siyaseta dijminane ya xwe digel xelkê xwe û derve reftar kiriye encams vê siyasetê û encama van destêverdan di karûbarêb welatên din de bûye sebeba vê yekê ki niha em dibînin ku ev heyama çend mehan e şereke pir giran û xwînavî li pey xwe aniye şerê Amerîk û Îsraîlê ji aliyekê û Komara Îslamî ji aliyek din ve û çend meh beriya niha yanî şerê 12 rojan bû di navber Îsraîl û Komara Îslamî de ku hejmarek zêde ji serkirdeyên Komara Îslamî hatin kuştin û fermandeyên Komara Îslamî hatin kuştin û zirarên aborî li Komara Îslamî ketin û ji ber vê ku neçar bikin da ku dev ji siyaseta çêkirina bombeya navikî berde lê mixabin dev jê berneda û siyaseta xwe berdewam kir tevî vê ku navendên navikî hatin bombebarankirin ev û madeya meyandî ku zêdey 40 kîlogereme ev her maye dema ku ev maye û şêwaza çêkirina bombeya naivkî her berdest maye bila hinek kesên pispor û alavên vê nemabin ev metirsiya her heye û her ev yek jî bo bi sebeba şerek ku niha digel we diaxvim ev şera berdewame û texmîn nayêkirin ku dê heta çi demekê berdewam be û dema ku wiha ye bandora vê li ser kurdistanê û rewşa xebata me jî heye.

**2: Kek Hesen gelek kes behsa vê yekê dikin ku rewşek pir baş bo Kurdan hatiye pêş, gelo hûn vê rewşê wek derfet dibînin û emê Kurd dibe çawan pêngavan hilgirin?**

Bersiv: Yaku behsa vê tê kirin ku li şûna vî şerî de derfetek hatiye pêş yan dibêjin beriya vê hatibû pêş û dubare bûye raste derfeteke bo Kurdan bitaybet bo Kurd li Rojhilatê Kurdistanê ji ber ku ev hereketa digihîje cihekê ku Komara Îslamî dê bê herifîne û Korama Îslamî bo me gelê Kurd û bo hemû azadîxwazên Îranê berbest û astengiyeke bo dabînbûna daxwaziyên me li Îranê de weke demokrasî û weke ev mijarên ku min li jorê de behs kirin afirandibûn dema ku wiha ye eva derfeteke bo vê ku ev rejîma berbeste bo dabînbûna mafên me dibe ji holê bê rakirin di rewşek wiha eger em bikarin digel Opozisyona demokrat a Îranê desthilateke demokratîk û xelkî bînin ser kar. Beşek ji daxwaziyên me abîn dibin egerek din heye ku ev şera negihîje wî cihî yan aliyên şer nexwazin bigihîje wir ku Komara Îslamî biherife demaku wiha Komara Îslamî ku dimîne ev Komara Îslamî ya beriya şer nine û wir şûnda lawaz dibe şiyana vê kêm dibe û her kêmbûna şiyana vê jî meydana xebata me berfirehtir dike û xebata me bibandortir dike ji bo vê ku xebeta me bo gihîştin bi armancên me nêzîktir dibe dema ku wiha ye erê derfetike û divê mifahê jê wergirin çi di îhtimala herifîna Komara Îslamî de bi awayekê û çi di mana Komara Îslamî de bi bê desthilatekî weke niha de yan bi şiyaneke kêm eger bimîne meydana xebatê bo me xweştir dike lê hevdem li mifah wergirtin li vê derfetê ku min bo we behs kir dibe hinek astengiyên din jî li pey xwe bîne êrîşên zêdtir bo ser xelkê me destbiserkirina xelkê me û toparankirin û moşekbarankirina baregehên me evana jî bê hebin di haleta duyem de ku min ji we ra got eger bimîne û meydana xebatê bo me berfiretir dibe lê dibe ku destê vê bi hemû lawaziyan bûna derbelêdan bi me girêdayî nebin û nîgeraniyên wiha jî hene.

**3: Me dît ku hevpeymanya siyasî ya hêzên Îranê rû li Azerî û Turkan peyamek belavkirin ev peyame çi girîng heye?**

Bersiv: Ez hez dikin vê yekê ji te re bêjim ku hêzên Rohilatê Kurdistanê demek dirêje ku xebatê dikin beşek ji wan li serdema Şa de xebat dikirin ji bo mafên neteweyî yên xwe, û hemû digel hev di serdema Komara Îslamî de jî xebat bo mafên neteweyî yên xwe kirine û lê di berdewamiya xebatê de ev rastiya bo wan derketiye ku her aliyek bi tenê xebat bike encema karên van pir kêm dibe bandorkirina wan li ser cih û rewta xebatê kêmtire û ya ku dibe bighîjnê di rewta xebatê de di encamê de gihîştine bi vê rastiyê ku ev xebate bi tenê û bi hêzekê û bi berpirsaiyetiya hêzekê cîbicî nabe û dibe yekgirtî bin taybetî li wan xalên ku hevparin li ser wan yên weke herfîna Komara Îslamî weke damokrasî bo Îranê weke wekheviya mafê jin li civakê de weke mafê mirov evane hemû xalên wisane ku em hemû li ser van hevparin eger hinek bîr û boçûnên wan partiyan digel yekyitir cudahî hebin lê li ser mijarên giştî mafên mirovî û demokrasî hevparin û li ser esasa wan xalên hevpar me yekgirtine bo yek armancî û ji bo vê ku armanca me qahîm û bihêz be bo vê ku yekdeng bin pêngavên me havêtina xebatê bihevre û evê ku mil bi milê hev armancên xwe ber bi pêşve bibin. Eva cihê keyxweşiyê ye ku piştî derbasbûna 8 mehan nîqaşkirin di navenda Diyalogê de gihîştin bi vê encamê ku beriya her tiştî ev 5 alî vê navendê pêk bînin û cihê keyxweşiyê ye û aliyê 6emîn jî tevlî bû û eva pêngavek gelek girîng bû ku me bihevre avêt.


Ji aliyek din ve em dixwazin bibêjin ku ev hevpeymaniya me tenê li dijî Komara Îslamiye tenê li pêxema bidestveanîna demokrasî û mafên neteweyî û daxwaziyên din yên xelkê Kurdistanê ne li dijî ti dewleteke din li dijî ti neteweyek din nîne û li pêxema bi kêmzanîn an dijmnayetî kirin digel ti aliyek din nîne ev hevpeymaniya ji ber vê ye a tenê li berjewendiyên Kurdan deye û li dijî ti aliyek din nîne.

**4:Kek Hesen dawî pirsa min li ser vê ye ku pêkhateya desthilatê piştî dawî hatin bi Komara Îslamî dê çavan be da ku hemû netewe û kurd jî mafê biryardanê hebin û birastî bikarin rola xwe hebin?**

yek ji ev haletên ku zilim tê de hatiye kirin li derheq neteweyên din û yek ji van haletên ku cûdahîdanîn dinavbera yek neteweye û neteweyên din û olên din de ev yeka bû ku desthilata navendî xwastiye xwe bitenê xwedî desthilat bibîne û xwe xwadiyê Îranê binîne û neteweyên din weke amûrek bibîne ku di destê vî dene û milkecê xwe bike ku fermanberê wî ne ya bêje vê bikin çavan bixwaze wisa digel wan reftar bike lê xebata neteweyên Îranê ji bo tişteke berewajiyê vê yekê ye xebeta neteweyên Îranê bo vê ye ku Îran bo hemû neteweyan e Îran milkê hemûyan hemû xwe dinav de bibînin hemû di nav vê Îranê de xwedî maf bin cûdahî tunebe înhisartelebî tunebe evane hemû ev taybetmendîne ku xebata gelê Îranê bo hewl didin ku hikûmeteke demokrasî û gelî di Îranê de li şûna vê desthilata niha heye bigirin dest û berewajiyê desthilata niha be bi bê cudahî û hemû di birêveberî û îdareya dewletan de divê pişkdar bin di rewşek wiha de tu nîgeraniyek bo parçebûna Îranê yan hinek kes dibêjin tecziyeteleb tiştek wisa nîne û di rewşek wiha de hemû xwe xwediyê wî welatî dizanin û li pêxema wî welatî ya destê wî bê qisûrî neke ji ber vê ye hêviya neteweyan eve ku desthilsta Îranê ku ev desthilatên xirab yên niha ku hene ev nemînin Îranê ya xwe bizane û hemû Îraniyan jî Îranî bizane

**Gelek Spas kek Hesen Şerefî**

# Nûnerî û hêzdarkirina jinan, pêwîstiyeke siyasî ji bo pêşerojeke dêmokratîk



N. Mojgan Elîpûr
W. Hesen Mukerem

Eger em li têkoşîna gelê Kurd li Rojhilatê Kurdistanê binêrin, em dibînin ku têkoşîna ji bo dêmokrasiyê li Rojhilatê Kurdistanê ne tenê têkoşîna guhertina rejîmê bû, lê di heman demê de têkoşîna guhertina bingeha pergala siyasî û civakî bûye. Demokrasî wateya xwe ya tevahî digire dema ku hemû beşên civakê bikaribin bi wekhevî beşdarî pêvajoya biryardan û çêkirina polîtîkayê bibin. Di vê çarçoveyê de, beşdariya jinan ne tenê daxwazek zayendî û civakî ye, lê di heman demê de pêdiviyek siyasî ya bingehîn e.

Beşdarbûna jinan di siyaset û hikûmetê de yek ji prensîbên sereke yên demokrasiyê ye, ji ber ku demokrasî ne tenê li ser hilbijartinan e, lê di heman demê de li ser temsîliyeta rastîn û wekheviyê di çêkirina siyaset û biryardanê de ye. Bêyî beşdariya çalak a jinan û rola wan di avakirina hikûmetê de, demokrasiyeke tam bi awayeke ku wekhevî û hevsengiyek di navbera beşdarbûna hemû beşên civakê de hebe, nayê misogerkirin.

Femînîzma siyasî yek ji girîngtirîn tevgerên rewşenbîrî yên sedsalên 20 û 21an e ku hewl dide têkiliya di navbera zayend û desthilatdariyê de şîrove bike. Ji perspektîfa vê teoriyê ve, siyaset ne tenê qadeke ji bo biryardanê ye, lê di heman demê de qadeke ku têkiliyên desthilatdariyê lê çêdibin û berdewam dikin e. Dîroka têkoşîn û ezmûna jinan modelek serketî ye.

Jin di gelek civakan de ji pêvajoyên biryardana siyasî hatine dûrxistin. Desthilata siyasî li Îranê di bin Komara Îslamî de her tim hewl daye ku desthilatdariyê di çarçoveyek siyasî ya teng a zıplama  de bihêle û qet nehiştiye ku jin bi bandor beşdar bibin. Bi rastî, hebûna partiyên siyasî û rola wan a bi bandor li ser civaka Kurdî dikare weke sedema sereke were hesibandin.

Li gorî vê, ji perspektîfa vê teoriyê ve, modela têkoşîna jinan û beşdariya jinan di siyasetê de ne tenê ji bo mijarên zayendî û wekheviyê ye, lê di heman demê de ji bo guhertina şêweyê desthilatdarî û biryardanê ye jî. Bi gotineke din, jinan bi rêya femînîzma siyasî ji bo wekhevî, edalet û demokrasiyê têkoşîn kirine.

Bê guman, mijara jinan rasterast bi mijara demokrasiyê ve girêdayî ye. Demokrasî ne tenê tê wateya hilbijartin, lê di heman demê de temsîliyeta rastîn a civakê jî tê wateyê. Ger nîvê civakê, jin, ji pêvajoya biryardanê bêpar bimînin û nikaribin bi tevahî beşdarî hemû waran bibin, pergal nikare tevahiya civakê temsîl bike. Ev mijar û tevgerên li pey hev ên çend dehsalên borî, ku ya herî berbiçav tevgera Jînayê ye ku jinan tê de roleke pêşeng lîstin, di nav van hewldanan de ne.

Bêyî rola jinan, behsa dîroka têkoşîna azadî û demokrasiyê ya gelê Kurd nayê kirin. Di qonaxên cuda yên têkoşîna neteweyî û siyasî ya gelê Kurd li Rojhilatê Kurdistanê de, jin her tim beşek girîng a tevgeran bûne, çi rasterast û eşkere beşdarî refên hêzên Pêşmerge



yên hêzên Kurdî bibin, çi jî di nava rojhilat de bin; Ji rêxistinên civaka sivîl bigire heya rêxistinkirina civakî û afirandina hişmendiya neteweyî û siyasî. Vê beşdarbûnê bi awayekî xweber çanda siyasî ya civakê guhertiye û fikra temsîliyeta jinan di siyasetê de pêş xistiye.

Bi awayeke zelaltir, bi nihêrîna li dîrokê, em dibînin ku jinên Kurd ne tenê piştgirên têkoşînê bûn, lê di heman demê de beşek bingehîn a têkoşîna ku armanca wê guhertina pergala desthilatdariyê li Îranê bû jî bûn. Ev nîşan dide ku beşdariya jinan di siyasetê de di civaka Kurdî de ne daxwazek nû ye, lê berdewamiya dîroka têkoşînê ye.

Weke ku me li jor behs kir û bi berçavgirtina rewşa heyî ku dawiya jiyana dîktator pir nêzîk e, avakirina hikûmetê qonaxek girîng e di pêvajoya veguhestina têkoşînê bo pergalê de. Di vê qonaxê de, ew nirx û ramanên têkoşînê vediguhezîne saziyên siyasî û rêveberiyê.

Eger jin di vê qonaxê de beşdar nebin, sîstema siyasî dê bi tevahî nûnertiya civakê neke. Beşdarbûna jinan di avakirina hikûmetê de dikare sîstema siyasî bêtir ber bi edalet û wekheviya civakî ve bibe. Nûnertiya jinan ne tenê pirsek îstatîstîkî ye, ew pirsek bingehîn a edaleta siyasî ye. Sîstemek ku jin bi tevahî beşdarî biryardanê nebin, dê bi rastî hêza beşek girîng a civakê ya di desthilatdariyê de winda bike.

Her ku Rojhilatê Kurdistanê ber bi sîstemeke demokratîk ve diçe, beşdariya jinan divê bibe yek ji prensîbên sereke yên wê sîstemê. Demokrasiyeke bihêz ew e ku dikare nûnertiya hemû beşên civakê bike, ji ber vê yekê divê ji bo hemû beşên civakê planeke beşdariya wekhev hebe. Di vî warî de, beşdariya jinan ne tenê mafek e ku divê were dayîn, lê hêzek e ku sîstema siyasî biguherîne.

Herweke ku dîrokê nîşan daye, jinên Kurd li Rojhilatê Kurdistanê her tim beşek girîng a têkoşîna azadî û demokrasiyê bûne. Ew di warên corbicor de beşdar bûne û di afirandina hişmendiya siyasî di civakê de bûne. Ji ber vê yekê, divê ev rastî bibe bingeha ramana siyasî ya pêşerojê.

## Peyama Navenda Rêxistinên Sivîl ên Rojhilatê Kurdistanê bi Boneya -80Saliya Damezirandina Yekîtiya Jinan



Îro 24'ê Reşeme ya 1404'an, hevdem e digel 80-saliya damezirandina Yekîtiya Jinên Demokrat ên Kurdistana Îranê.

Heştê sal berê, Yekîtiya Jinan li ser destê Hizba Dêmokrat a Kurdistanê (Hizba damezrênera Komara Kurdistanê) hate avakirin. Ger em bixwazin giringiya vê hewildana bêmînak fêm bikin, pêwîst e em li wê rewşa dîrokî ya wê demê binêrin, serdemek ku civaka Kurdistanê bi giştî û çîna jinan bi taybetî di nava bêparî û nexwendewariyeke dijwar de bûn, Jin ji gelek aliyan ve di bin zilm û zora pergala baviksalar a civaka feodal de dihatin çewsandin, Di wê demê de, li gelek welatên cîhanê jinan mafê dengdanê tune bû û heta ji mafên xwe yên herî bingehîn jî bêpar bûn.

Nêrîna kûr li ser pirsa jinê û damezirandina rêxistineke jinan, vedigere bo hûrbinî û aqilmendiya rêberên wê demê yên Hizba Demokrat û Komara Kurdistanê, ku di pêş hemûyan de Pêşewa Qazî Mihemed hebû. Wan giringiya pêgeha jinê di civakê de dît û jin teşwîq kirin ku bên qada xebata siyasî û sivîl, bibin daxwazkar û parêzvanên mafên xwe û çarenûsa xwe bi destê xwe diyar bikin.


Di roja îro de ku em dibînin li civaka Kurdistanê, jin di gelek aliyan de roleke pir pêşketî û pêşeng dileyizin û di tu xebateke sivîl û siyasî de cihê wan vala nîne, di Serhildana Jîna yê de di bin dirûşma "Jin, Jiyan, Azadî" de roleke berçav gêran, di parastina jîngehê, birêvebirina dersên zimanê kurdî û gelek warên çandî yên din de xwedî rolekî bi bandor û balkêş in. Ev yek vedigere bo wê yekê ku xwedî paşxaneyeke ramanî û kiryarî ya bihêz in. Di vî warî de, rola Yekîtiya Jinên Demokrat di hişyarkirina jinên kurd de di van heşt dehkên borî de, cihê serbilindî û girîngîpêdanê ye.

Li vir de ye ku giringiya xebata rêxistinî ji bo me derdikeve holê. Em dibînin civaka Rojhilatê Kurdistanê bi paşxaneyeke heştê salî ya xebatê, sûd ji hemû potansiyel û şiyana çîn û qatên civakê wergirtiye û hevdem xebateke piralî meşandiye. Ji ber wê ye ku Rojhilatê Kurdistanê li Îran û herêmê, wek yek ji civakên herî bihêz, rêxistinkirî û zindî tê naskirin.

Navenda Rêxistinên Sivîl ên Rojhilatê Kurdistanê bi boneya 80-saliya damezirandina Yekîtiya Jinên Demokrat ên Kurdistana Îranê, pîrozbahiya xwe ya herî germ pêşkêşî Yekîtiya Jinan û hemû jinên Kurdistanê dike. Em hêvî dikin armancên wan ên sereke, ku bextewariya civaka kurdewarî û wekheviya zayendî ye, pêk werin.

**Navenda Rêxistinên Sivîl ên Rojhilatê Kurdistanê**
**24'ê Reşemiya 1404'an**

# Bandora psîkolojîk a şer û nezelaliyê li ser mirovên sivîl



N. Sefiye Xalidî



Jiyana di bin siya şer de, Şerê çekdarî bandorê li civakê dike, ji wêrankirina berbiçav a binesaziyê û pergalên aborî wêdetir. Yek ji encamên şer ên herî kûr lê kêmtir di cih de xuya ye, bandora wê li ser refaha psîkolojîk a nifûsa sivîl e. Dema ku civakek di nav tengezariya leşkerî ya domdar, nezelaliya li ser pêşerojê û astengiyên jiyana rojane dijî, bandorek mezin li ser tenduristiya welatiyên wê dibe.

Di rewşên ku mirov ji bo demek dirêj di hundurê malên xwe de dimînin de, rûtînên rojane têne qut kirin, û herikîna nûçeyên alarmê li ser nîqaşa giştî serdest e, stres û fikarên kolektîf pir caran berbelav dibin.

Faktoreke navendî ya psîkolojîk di jîngehên şer de nezelaliya kronîk e. Mirov bi xwezayî di jiyana xwe de li aramiyê û pêşbînîkirinê digerin, dema ku ev hêman winda dibin, fikar dikare zû cihê wan bigire. Di demên pevçûnan de, dibe ku kes nizanibin ka krîz dê çiqas bidome, ewlehiya wan a fîzîkî ewle ye, an jî çi veguherînên siyasî û civakî dikarin li pey werin.

Ev nezelalî hişê mirovan dixe rewşek hişyariyê ya dirêj. Lêkolînên psîkolojîk nîşan dane ku rewşên domdar ên hişyariyê dikarin bibin sedema têkçûna xewê, zehmetiya balkişandinê, acizbûnê, û hestên domdar ên tirsê an lawaziyê.Bi heman awayî têkdana jiyana civakî û aborî jî heye. Dibe ku cihên kar werin girtin, saziyên perwerdehiyê çalakiyan rawestînin, û tevgerîn ji ber fikarên ewlehiyê dikare were sînordarkirin.

Rûtînên rojane – çûnûhatin ji bo kombûnên civakî, jiyana çandî û têkiliyên rojane yên hêsan – di peydakirina avahî û wateyê de ji bo jiyana mirovan roleke girîng dilîzin.

Dema ku ev şêwaz ji nişkê ve têne qutkirin, dibe ku mirov kontrola xwe li ser şert û mercên xwe winda bikin. Ev hesta bêhêziyê bi tundî bi zêdebûna asta tengahiya psîkolojîk ve girêdayî ye, di nav de fikar û nîşanên depresyonê.
Çavkaniyek din a girîng a stresa psîkolojîk di demên krîzê/ şer de hebûna hem hêvî û hem jî tirsê di heman civakê de ye.

Dema ku welatek bi nezelaliyê re rû bi rû dimîne, mirov pir caran hêviyên cûda li ser pêşerojê hene. Hin dikarin hêvî bikin ku guhertinên siyasî an başbûnên civakî bikin, hinên din jî dikarin ji bêîstîqrarî, berdewamiya pergala heyî, an encamên nenas bitirsin.

Di heman demê de hêvî û tirs dikare zexta hestyarî biafirîne. Hişê mirovan bi gelemperî zehmet dibîne ku bi rewşên ku pêşeroj dikare bi awayên pir cûda pêş bikeve û yek ji wan îhtîmalan ne zelal an jî teqez be re mijûl bibe.Atmosfera civakî di demên weha de dikare hestên kolektîf jî zêde bike. Dema ku beşên mezin ên nifûsê tirs û nezelaliyên wekhev dijîn, stres dikare ji takekesî bêtir bibe kolektîf.

Psîkologên civakî vê diyardeyê wekî „hewaya hestyarî ya hevpar" bi nav dikin, ku tê de rewşa giştî ya civakê ji hêla ezmûnên hevpar ên gef û nezelaliyê ve tê şekildan. Belavbûna domdar a nûçe, gotegot û analîzan bi rêya medyaya dîjîtal dikare vê dînamîkê zêde bike, têgihîştina xetereyê xurt bike û zexta hestyarî dirêj bike.

Dibe ku hin komên di civakê de di demên krîzê de zexta psîkolojîk a zêdetir hîs bikin. Dema ku guhertinên siyasî dikarin bandorê li qanûnan, rêzikên civakî, an derfetên mirovan bikin, gelek kes ji pêşeroja xwe ditirsin. Ew kesên ku jiyana wan bêtir bi van pergalan ve girêdayî ye, dibe ku vê fikarê bi tundtir hîs bikin.

Mînak: jin, ciwan û xwendekar dikarin bêtir li ser tiştê ku dê di pêşerojê de bibe fikar bikin, ji ber ku perwerdehiya wan, kar û derfetên wan ên civakî bi polîtîka û biryarên pêşerojê ve girêdayî ne.

Medya di demên pevçûnan de roleke girîng di hestên mirovan de jî dilîze. Dema ku mirov bi berdewamî rastî sernavên nûçeyên tirsnak, wêneyên acizker û nûvekirinên berdewam tên, hesta wan a tirs û xetereyê dikare zêde bibe – her çend ew ji pevçûna rastîn dûr bin jî.

Lêkolînên di psîkolojiya medyayê de nîşan didin ku dubare dîtina nûçeyên stresdar dikare mirovan westiyayî û bêtir fikar bike, nemaze dema ku ew hîs dikin ku kontrola wan li ser tiştê ku diqewime hindik e.

Ji ber vê yekê, lênêrîna tenduristiya derûnî ya mirovan di dema pevçûnan de bi qasî çareserkirina pirsgirêkên siyasî an leşkerî girîng e.

Civakên ku di şer an aloziyek cidî re derbas dibin dikarin ji çalakiyên ku berxwedana civakê xurt dikin sûd werbigirin.

Danûstandina zelal, piştgiriya hev, peydakirina gihîştina xizmetên tenduristiya derûnî, û parastina têkiliyên civakî -heta bi awayên piçûk jî- dikare ji bo her kesî bibe alîkar ku stres kêm bibe.
Di dawiyê de, tenduristiya derûnî ya sivîlan beşek girîng a hêza netewevyekê ye, her çend pir caran nayê dîtin jî. Her çend zirara fîzîkî ya ji pevçûnan dikare bi rêya ji nû ve avakirin û vejîna aborî were sererast kirin jî, birînên hestyarî û psîkolojîk ên ku mirov hildigirin dikarin pir dirêjtir bimînin. Fêmkirin û çareserkirina van bandoran ne tenê ji ber sedemên mirovî girîng e, lê di heman demê de ji bo vegerandina aramiya civakî piştî krîzekê jî girîng e.
Çareserkirina tenduristiya derûnî, pêşxistina hevgirtina civakî, misogerkirina ragihandina zelal, û dabînkirina gihîştina piştgiriya psîkolojîk ji bo avakirina berxwedana civakî girîng in. Birînên psîkolojîk dibe ku ji zirara fîzîkî kêmtir xuya bibin, lê ew pir caran pir dirêjtir dom dikin.

Ji ber vê yekê, naskirin û çareserkirina bandora tenduristiya derûnî ya pevçûnê ne tenê pêdiviyek mirovî ye, lê di heman demê de gavek girîng e ber bi vegerandina aramiya civakî û alîkariya civakan ji bo vegera jiyana normal.

**„Berdewamiya şer tenê zirarê dide mirovên sivîl. Her rojek bi şer, birînên kûr ên hestyarî dihêle ku piştî şer jî demek dirêj dom dikin."**

# Binpêkariyên mafê mirovî li Kurdistanê

## Êrîşa dironî bo ser binkeyên hizba Demokrat

Kempa cihê akincîbûna malbatên hizba Demokrat a Kurdistana Îranê li bajarê Koyê, bo carek din ji aliyê sipaha pasdaran ve bû armanca êrîşan

Piştînîvroya îro Duşemî, 25ê Reşemeya 1404an a Rojî, rejîma Îranê bi dironan êrîş kire ser kempa malbatên hizba demokrat.

Hêjayê gotinê ye ku şeva derbasbûyî jî kempa Zirgiwêz li sînorê Silêmaniyê bi 3 mûşekan bûye armanca wan êrîşan.

Ji dema ku alozî û şerê rejîma Îranê digel Amerîka û Îsraîlê dest pê kiriye, xaka Kurdistan û binkên hizbên siyasî yên rojhilatê Kurdistanê bi berdewamî bûne amanca êrîşên rêjîma Îranê.

Heya dema amadekirina vê nûçeyê,bi sedema wan êrîşên rêjîma terorîstperwer a Îranê, li wan kempên hizbên Kurdistana Îranê û Herêma Kurdistanê de 8 kes şehîd û dehan kes jî birîndar bûne.



## Agahdariya Lezgîn û Bangewaziya Hevpeymaniya Hizbên Siyasî yên Kurdistana Îranê





**Em êrîşên terorîstî yên rejîma Îranê bo ser penaber û partiyên siyasî li Herêma Kurdistanê şermezar dikin**
**Rû li:**
**Sekreterê Giştî û Encumena Ewlehiya Neteweyên Yekbûyî!**
**Dewletên Yekbûyî yên Amerîka û welatên hevpeyman!**
**Hikûmeta Navendî ya Iraqê û saziyên navdewletî yên mafên mirov!**

Di nava 21 rojên borî de, rejîma Komara Îslamî ya Îranê di berdewamiya tawanên xwe yên sîstematîk de, bi dehan caran serweriya siyasî û niştimanî ya Iraqê û pîwerên navdewletî bi awayekî berçav binpê kiriye. Ev rejîm bi êrîşên berdewam û hovane yên mûşekî û dironî, kampên penaberan û baregehên partiyên siyasî yên Kurdistana Îranê kiriye armanc.

Ev destdirêjî û sînor-derbaskirin û êrîşên mûşekî di demekê de ne ku partiyên siyasî yên Kurdistana Îranê bi salan e xebata xwe li ser têkoşîna siyasî hûr kirine û ti cur gefeke leşkerî bo ser herêmê nebûne û nînin. Lewma ev êrîşên berdewam, tenê hincetek in ji bo dubarekirina xola tundûtûjî û serkutkariyê û afirandina tirs û xofê.
Ev kiryarên destdirêjkarane, jiyana bi sedan kesên sivîl, di nav de hejmareke zêde ya zarokan, rûbirûyî metirsiyeke micid kiriye û bûye sedema awarebûna dubare ya malbatên medenî û bêparastin di rewşeke giran a mirovî de.

Em daxwazê ji civaka navdewletî, bi taybetî Dewletên Yekbûyî yên Amerîka û hevpeymanên navdewletî dikin:
**1.** Bi bikaranîna hemû amrazên bandora xwe, givaşên li ser rejîma Îranê zêde bikin ji bo rawestandina bilez a van êrîşan û garantîkirina ewlehiya penaberan.
**2.** Ji bo parastina jiyana malbat û xelkê sivîl li hember êrîşên dironî, rêkarên pêwîst werin girtin, ew jî bi dabînkirina sîstemên berevaniya asmanî bo navçên niştecihbûna penaberan.
**3.** Tîmeke lêkolînê ya serbixwe ji bo lêkolînkirina li ser aiyên cudaye van tawanan û destnîşankirina wan ziyanên gihîştine penaberan, bişînin herêmê.

Em daxwazê ji hikûmeta Iraqê wek welat û hikûmeta mêvandar dikin:
Li gorî yasayên navdewletî, hikûmeta Iraqê berpirsyarê rasterast e di parastina jiyana penaber û çalakvanên siyasî yên Kurd li ser axa xwe. Divê hikûmeta Iraqê ji daxuyaniyên rûtîn, zêdetir gavan biavêje û ewlehiya giyanî ya van kesan garantî bike. Divê bi biryardarî li hember binpêkirina serweriya xwe ji aliyê Îranê ve bisekinê û di astên bilind ên navdewletî de bikeve pey vê mijarê.
Dema gavan avêtinê niha ye. Bêdengî li hember van tawanan, çiraya kesk e ji bo berdewamiya terorîzma dewletî.



**Hevpeymaniya Hêzên Siyasî yên Kurdistana Îranê**
**20ê Adara 2026ê a Zayînî**

# Agirî

- Rojnameya "Agirî" di van malperên jêrên de bixwînin:
- www.Kurdistanmedia.com
- www.Agirimedia.org
- rojnamaagiri@gmail.com
- www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE E - Mail: Agiri2003@gmail.com Hejmar (514)

